# SÛRÎYE | SYRIA

## USCIRF– RECOMMENDED FOR COUNTRIES OF PARTICULAR CONCERN (CPC)

Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya DY (USCIRF) encûmeneke azad û cotpartîyî ya DY ye ku di seranserê dinyayê de çavdêrîya serbestîya dînî û bawerîyê dike. USCIRF-a ku li ser hîmê Qanûnê Azadîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA) yê 1998ê avakirî ye, di seranserê dinyayê de ji bo çavdêrîya binpêkirinên azadîya dînî û bawerîyê de standardên Navneteweyî bi kar tîne û ji serekî, wezîrê karen derve û Kongresê re salixê şîretên siyasete pêşkêş dike. USCIRF, dezgeheke ji Wezîrîya Dewleta DY cuda ye û azad e. Raporta Salane ya 2020ê encama xebatên yek salekê ya bibelgekirina binpêkirinên qadê û şîretên siyasetên ḥikûmeta DY nîşan dide. Raporta Salane ya 2020ê heyama ji Çileyê Paşîn ê 2019ê heta Çileyê Pêşîn ê 2019ê digire nava xwe lê di hin rewşan de hin bûyerên giring ên berî yan piştî vê heyamê jî tên xuyandin. Ji bo zanyarîya bêtir li ser USCIRFê li vê lînka sîteya înternetê binihêrin yan jî ji jimara têlefona 202-523-3240ê bi USCIRFê re êkser pêwendî daynin.

## BIDESTKETÎYÊN HÎMÎ

Di 2019an de li Sûrîyeyê serbestîya dînî, nexasîm ji ber şerê li welêt dewam kir û ezmeya însanî di binê tehdîdeke ciddî de ma. Bibêşketina herî hêjayî gotinê; ji alîyê Hevkarîya Cîhanî ya li Dijî DAÎŞ-ê (HCDD) ve di meha Adarê de li gundê Baxuza rojhilat ji kelehên wan ên paşîn bi serfirazî bidawîhatina tevgera paqijkirina şervanên Dewleta Îslamî ya Îraqê û Şamê (DAÎŞ) bû. Di heyama ku herêmê bi awayekî fi'lî muraqebe dikir de, îdeolocîya komkujîyê û tevgerên DAÎŞê li dijî çendîn kêmanîyên dînî û Mislimanên Sinnî yên pirranî tehdîda herî mezin pêk dianî. Tevlî vî awayî, ji ber ku ji bo bêtirî 68.000 şervan û endamên malbatên wan ên di kempên komkirinê de bicîhkirî hîç çareyeke daîmî nikaribû bê dîtin û dewamkirina êrîşên bermayîyên DAÎŞê li dijî medenîyan, HCDDê û endamên Hêzên Sûrîyeya Demokratîk (HSD) nîşana dibîrhatinên herî mezin ên tehdîda DAÎŞê bû.

Herweha digel ku di 2019an de bî berovajîkirina pîlanên DY bi qerarê bipaşvevekişîna hêzên wê yên bakurê rojhilat dest pê kiribe jî, di Çirîya Pêşîn de dema ku ev vekişîn û îşxala Tirkîyeyê ya bi îhtîmala demdirêjîyê dest pê kir ev awa derxistina hin komên qewmî û dînî ji "herêma ewle" ya ku Tirkîye bi hevkarê xwe Sepeya Sûrîyeya Azad (SSA) re ava kiribû, zûtir kir. Ev bûyer ji bilî vê yekê her wek guherandina cîhên dînî, qewmî û kulturî yên ḥikûmeta Tirk di 2018an de li Efrînê pêk anîbû, a rastî pirranîya wan bûn sebebê fikara ku multecîyên Sûrîyeyî yên li cîhên cuda yên Sûrîyeyê dijîn, êdî bi awayekî komî berê wan dide herêma îşxalê jî. Birêvebirîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê (BXBRS) di vê navberê de perçeyê mayî yê bakurê rojhilat di destê xwe de hişt û di herêmên di Birêvebirîya wan de hê jî di dereceyeke bêtir de serbestîya dînî û heqên din ên medenî peyder kir.

Her çend di 2019an de li herêmên di binê kontrola rejimê de li ser bûyerên binpêkirina serbestîya dînî îsbatên kêmtir hebin jî, hikûmet, tevlî raperkên ciddî li dijî multecî û komên ku gumana wan a tevlîbûna xwenîşandanên li dijî rejime û şerkirinê tê kirin, sûcê binpêkirina hiqûqê însanan bi awayekî mezin dewam kir. Bi operasyonên ku hêzên rejimê û Îran, Hîzbullaha Libnanê û hevkarên Rûs ji Nîsanê ve ji bo jinûvesitandina herêmên di binê kontrola şoreşgeran de komên çekdar û jêrzemîna medenî ji xwe re kiribûn mebest bûn bi rê ve dibirin, rewşa dijwar a tevlî hemû medenîyan kêmanîyên dînî û qewmî li muhafezeya Îdlîbê dewam kir. Her çend di vê rewşê de nirxandina rewşa serbestîya dînî zehmet be jî, Heyeta Tehrîra Şamê (HTŞ) ya li muhafezeya Îdlîbê tevdigere û DY wê wek terorîst bi nav kiriye di Temûzê de tevlî tecawizkirin û bi recimkirinê kuştina jineke Ermenî jî, zordarîya xwe ya dînî dewam kiriye.

## LI HIKÛMETA DEWLETÊN YEKBÛYÎ (DY) ŞÎRETIN

- Bi awayê ku Qanûnê Azadîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA) bi nav kiriye ji ber ku Sûrîye binpêkirinên dijwar ên serbestîya dînî yên daîmî dike ew wek "welatê taybet ê endîşebar" (CPC) bê binavkirin;
- Bi awayê di IRFA-yê de binavkirî, ji ber ku ew binpêkirinên dijwar ên serbestîya dînî bi awayê sîstematîk daîmî dike, Heyeta Tehrîra Şamê (HTŞ) wek "dezgeha taybet a endîşebar" (EPC) bê binavkirin, yanî ev binavkirin bi tenê bi Elnusraya milekî HTŞê ye neyê bisînorkirin;
- Di çarçoveya Qanûnê Xelaskirin û Berpirsîyarîya Tovkujîya Îraq û Sûrîyeyê yê 2018ê (P.L. 115-300) de ji bo destekkirina kêmanîyên dînî û qewmî yên bêparastin ên li Sûrîyeyê destekdayîn; di çarçoveya Qanûnê Elie Wieselê yê Nehiştina Tovkujîyê û Zordarîyê (P.L. 115-441) de bikaranîna jêderan û serbestkirina 50 milyon Dolarê ku Koşka Sipî di nava Çirîya Paşîn de wê eşkere kir;
- Bi awayekî ciddî pêkirina ser Tirkîyeyê ji bo kirina ku ew ji bo derketina ji Sûrîyeyê teqwîmekê eşkere bike û ceyşa wê yan jî hevkarên Sepeya Sûrîyeya Azad (SSA) li bakurê rojhilatê Sûrîyeyê herêma xistiye destê xwe firehtir neke, li vê herêmê paqijîya dînî û qewmî neke û heqên kêmanîyên dînî û qewmî yên li wê derê bê parastin in bi awayên din binpê neke; û

- Firehkirina têkilî û alîkarîya DY-yê BXBRS-ê re, di vê mijarê de li herêmên bi tenê ji alîyê AANES-ê ve tên birêvebirin nirxandina mu’afîyetên pêdankirinên tevahî, bi rêya dezgehên civata medenî (NGO) yên guncaw û hevalên navmilletî yên ehlê karî yên wilo dayîna pere û bipêşvebirina tevgerên ji bernameyên herêmî yên bi mebesta bêtirkirina heqên navbuhurî yên wek di nava dînan de destekkirina xweşbînîyê, kêmkirina tengijînên nava mezheban û serbestîya dînî.

### JÊDER Û TEVGERÊN SEREKÎ YÊN USCIRF-ê

- **Rûniştin:** Parastina Cîhên Îbadetê û Cîhên Pîroz, Çirîya Pêşîn a 2019an
- **Danxuyandina Çapemenîyê:** Li Bakurê Rojhilatê Sûrîyeyê Hucûma Tirk
- **Danxuyandina Çapemenîyê:** Roja Dibîranîna Qurbanîyên Tevgerên Şiddeta Dînî yan Bawerîyê ya Navneteweyî

## Piştperde

Li gora texmînan nifûsa Sûrîyeyê ji 20 milyonan piçek kêmtir e lêbelê di Çirîya Paşîn a 2019an de 6,7 milyon multecîyên Sûrîyeyî li derveyê welêt bûn û 6,1 milyon kes jî kesên li hundir jicîhbûyî (IDPs) bûn. Ev nifûs hem ji alîyê qewmî û hem jî dînî ve cuda cuda ye; %74 Mislimanên Sinnî, %13 Mislimanên ‘Elewî, Şî’i û Îsma’îlî, %10 Filehên Suryanî, Maronît, Ermenî û yên din, %3 Durzî ne û pirr kêm jî Cihûyên Sûrîyeyî jî li Şamê û Helebê dijîn. Tevlî vî awayî, eger bi jimareke fewqul’ade multecî û IDP werin fikirîn, li welêt, di nava şerê ev neh sal in dewamkirî de nirxandina rastîya van jimaran zehmet e.

Digel ku li Sûrîyeyê Mislimanên Sinnî pirranî ne jî bavê serekkomarê vêga Beşar Esedî; Hafiz Elesed ji 1970yê desthilatdarîya xwe ve kêmanîyên dînî ‘Elewî di sinifên siyasî û eskerî de bûn serwer. Ev her du rejimên Esedî bi rêya çarçoveyeke fikreke tevlîhev a Be’sî, dijwarîya bi şiddet, îqnakirina dewlemendên bilind, û ji bo kêmanîyên din ên dînî bipêşvebirina mefhûmeke parastinê îqtîdarê bi awayekî temamî xistin dest. Lê ev çarçoveya şikêner di Adara 2011an de bi serhildaneke şe’bî hat şikandin û piştî ku hikûmet li dijî vê serîhildanê bi dijwarî dest dayê, serîhildan vegerîya şerê çekdarî; di serî de di sewîyeya şe’bî de bû lê di nava 2015an de çendîn fa’ilên herêmî û cîhanî jî xistibûn nava xwe. Di şerkirinan de tiştê herî balkêş ew bû ku hikûmêtê hîç guh nedida mirin û birîndarîyên medenîyan, ji bo ku hemû muxalifan biperçiqîne nexweşxaneyan, dêran û heta medreseyan dikir hedef.

## Dawîya Herêma di Kontrola DAÎŞê de

Di heyama hukmê DAÎŞê de li herêmên di binê kontrola wê de bi hezaran Fileh, Êzîdî, Mislimanê Şî’î û heta Mislimanên Sinnî yên desthilata wan qebûl nedikirin, tevlî revandin û kuştina wan jî, pirr zilm dîtin. Di Adara 2019an de li Sûrîyeyê ketina keleha wê ya paşîn ji alîyê parastina serbestîya dînî ve gaveke giring bû. Lêbelê digel jidestdana axê û di şertên zehmet de bi awayekî bêsînor zîndanîbûna şervanan û malbatên wan, bermayîyên DAÎŞê hê jî êrîşkirina hem bi ser kêmanîyên dînî û komên bêparastin ve û hem jî ser HCDD û HSDê dewam kirin. Wek nimûne, di mehên Temûzê û Çileyê Pêşîn de tirimpêlên bombe barkirî yên ku gumana wan a girêdana bi DAÎŞê ve dihat kirin li Qamîşloyê li nêzîkê dêran hatin teqandin û bûn sebebê birîndarîya medenîyan. DAÎŞê li nêzîkê Dêrazorê di 11ê Çirîya Paşîn de kuştina Keşeyê Ermenîyên Katolîk Hovsep Bedoyan û bavê wî xist sitûyê xwe. Ji bilî van di Tebaxê de di raporteke li ser operasyonên HCDDê ji DY re pêşkêşkirî de serekmufettîşê tevahî yê ji birêvebirina tevgerên muhtemel ên derveyê welêt berpirsîyar, hişyar kir ku dibe hê jî li Sûrîyeyê û Îraqê di nava 14.000-18.000î de şervanên DAÎŞê hebin û nîşanên jinûvederketinê didin.

## Rewşa Hessas a bakurê rojhilat

Li bakurê rojhilatê Sûrîyeyê herêmên di destê BXBRSê de bûn (ji alîyê HSDê ve dihatin parastin lê di paşîya salê de destekeke sînorkirî ya DY û HCDDê sitandin) di nava rewşa serbestîya dînî ya xuyayî merkezbûna xwe ya krîtîk dewam kir. Her wek sala berê, destûrdarên BXBRSê destûrdayîna xwe ya bi serbestî pêkanîna bawerîyê û bilêvkirina nasnameyên dînî yên mislimanan, filehan, êzîdîyan û yên din dewam kirin.

Lê di paşîya 2019an de di meha Çirîya Pêşîn de ji ber bi awayekî qismî vekişîna DY û îşxala hêzên Tirk, keysa BXBRSê ya di warê pêşkêşkirina serbestîya dînî de ket xetereke ciddî. Her çend hêzên Tirk digotin ew êrîşên xwe yên ber bi medenîyan ve di nava buhureke 120 kîlometreyî de dihêlin jî, komên hiqûqê însanan, SSA-ya di binê kontrola Tirkîyeyê de bi binpêkirinên ciddî yên hiqûqê însanî gunehbar kirin. Di 12ê Çirîya Pêşîn de şervanên Ehrarul Şerqîyeyê siyasetvana Kurd Hevrîn Xelefê ji tirimpêla wê derxistin û kuştin. Li gora xeberan, piştî çend rojan jî endamên dezgeheke din li Telebyedê dereke Ermenîyan pelişand û xwast wisa nîşan bide ku wek Yekîneyên Parastina Gel (YPG) a Kurd dêrê bi propagandaya xwe tije kiriye. Di encama van bûyerên şiddete de û bi tirsa firehbûna operasyonên Tirk, ji herêmê di serî de bêtirî 200.000 kesî revîyan; di paşîya 2019ê de hema hema 75.000 kes di sitargehên IDPyan de yan medreseyan de yan kempên multecîyan ên bakurê Îraqê de diman û texmînen 117.000 medenî vegerîyabûn. Li gora jêderên USCIRFê, tevlî endamên komeke bavmislimanên Fileh ên Kurd hin ji kesên ji cîhê xwe dûr neketin digel ku bi şiddete re rûbirû neman jî her tim ditirsîyan. Ji bo girtina rêya bêtirbûna şiddetê Yekîneyên Tirk, Rûs, Sûrîyeyê û DY-yê di rêyên serekî de derdiketin dewrîyeyê û

di encamê de di paşîya salê de di wê herêma sînorî de sakinbûneke kêmozêde pêk hat. Li herêmên wek ‘Efrînê yên Tirkîyeyê li wê herêmê dest danîbû ser wan kêmanîyên dînî û nexasim jî êzîdî û fileh bi zilm û cudakarîyê re rûbirû man û ew awa dewam kir.

## SIYASETA HÎMÎ YA DY

Di 2019an de di siyaseta DY ya ser Sûrîyeyê de hêzên guherînbar ên ku pevçûnên çekdar ji serî ve gelemşe dikin dîsa pêk hatin. Serektîya DY Ya HCDDê, bi hevkarîya HSDê û hevkarên din di 2019an de gihîşt asta xwe ya herî bilind: Di meha Adarê de pelişîna herêma DAÎŞê. Bakurê rojhilatê Sûrîyeyê ya demekê navenda hêza DAÎŞê bû lêbelê di du salên paşîn de di warê firehtirkirina serbestîya dînî de gelek bipêşveçûyî bû, ji bo Birêvebirîya Serek Donald J. Trumpî carekê din bû sebebê tengasîya siyasî. Koşka Sipî, di encama axaftinên xwe yên bi serekkomarê Tirkîyeyê Receb Teyîb Erdoxan de di 6ê Çîrîya Pêşîn de eşkere kir ku dê DY ji bakurê rojhilatê Sûrîyeyê bi temamî vekişe. Xezwa hêzên Tirkîyeyê ya piştî vî awayî qewimî li herêmê di nava leyîstikvanên serekê de bû sebebê hin dan û sitandinên bi fikar; Koşka Sipî li ser bi herêma sînorî sînorkirina operasyonên wê Tirkîyeyê hişyar kir û di encamê de bi navgînîya alîkarê serekî Michael R. Pence û Wezîrê Karên Derve Michael R. Pompeo rawestandineke şerî hat diyarkirin. Hêzên DY dîsa dest bi dewrîyeyên sînorkirî kirin û soz da ku ew ê jêderên heyatî yên li herêma bi Birêvebirîya BXBRSê de bên parastin bi vî awayî di nava hêzên çekdar ên li ser sînorî tevdigerin de nermbûneke mecbûrî pêk anî. Dewletên Yekbûyî destekkirina tevgerên însanî yên li hemûyî Sûrîyeyê dewam kir û di 2019an de ji bo tevgerên bi wî awayî hema hema 1,5 milyon Dolar veqetand. Di meha Çîrîya Pêşîn de Koşka Sipî ji bo komên bêparastin ên li Sûrîyeyê di çarçoveya îstîqrarê û tevgerên alîkarîyê de eşkere kir ku wê 50 milyon Dolarê din jî veqetandiye, lê di heyama dawîya dewra raportkirinê de hê ne diyar bû ka ev jêderên pereyi hatibûn belavkirin yan na.